Zemawendên çûnê!

Helbexşan an Pexşest.!

Mervanê Keleş

Dema em ji hev cûda bûn û ez bi rê ketim, mijek giran û nerînbir xak û asîman yekrewş dikir.!

Libên xunavê ku li nav mijê mîna morîkan hûr hûr diçirisîn û dixemiland wek fenerên hawarên dûr bi şermezarî dirijyan, mirov sermest dihiştin û berbang dijwartir dikirin û guhên min sor, sar, miç û hişk dihiştin !

Min xwe dabû ser wê riya dirêj û bi nehêniyan mişt, lê bê ku li xwe bizîvirim dengê te nîvketî dihat:

-Belê rê dirêje lê metirse ..tirs têkçûne.! Û ez bi rê ve diçûm ..!

Ji mala te baş dûr bibûm û ji riyên taxê di wê bêdengiyê de teqe-teqek jar ji lihevketina pêlava Min û keviran dihat û di mejiyê min de koncal dikolan min taxa we baş nas ne dikir lê te gotibû :

-taxa me bi piranî Ermeniyên penaberin.

Ha ên ku bi sosret ji nav lepên singoyên dema bê şerm filitîn.!

Dema ez giham serê taxê dêr ji min xuya bû, dengê keşê mîna dengê zarokekî zirz û zîrek ji kûr ve dihat :

-bilezî bilezî ..!

Ez tê ne gihiştim !

Û wî got :

-dem nayê kirîn...dem erzan û buhayî lê li tu deran nayê firotin !

Min xwe nêzîkî pencera dêrê kir serê xwe bi camên wê ve kir yek û destên xwe dan dora çavên xwe !

Çend mûmên dirêj, zirav û serî

bi ar hebûn bêrawestan canê xwe diherikandin

ronî û reşahî ji hev ne dihatin.

Cûda kirin û di qurçikikê de keşe di nav sermilka xwe ya zêrîn dixew re çûbû !

Bê raman min xwe vekişand û bi sistî riya xwe ajot !

Tev li min zanîbû ku sûk ji mala we pirrr dûre dîsan jî ez her bi rê ve çûm .. Ji bo çi ? !

Sar bû pirrr sar bû lê ez her peya diçûm !!

Li sûkê ez li tirêna bêoxiriya zingarî siwar bûm û min riya Şama şekir girt !

Şamê belê Şamê. Mezargeha mîrê tîpa kurdî ku li ser çiyayê wê Taxa Kurdan radizê û serê CELADET datîne ser balgeha neçariya xwe !

Li balefirgehê bîntengî bi derî û dîwaran ve hidiperikî û kursî ji rêwiyan direviyan û ez jî bi giriyê çend dostan ve mijûl bûm, kela hundurê min bê sînor bû ,bê hunerî û tirsê ez serûbinî hev dikirim. Çi tirs?!..Ji çi ?! Dengê te :

-Tirs têkçûne ..!

Lê kirasê tirsê ji min ne dibû û ez bi ba ketim .!

Û li nav berfa reş daketim !!

Û her tirsê hinavên min zeft kiribû !!

::::::